RÊYÊN BEXTEWERIYA HEVJÎNÊ

Vekoler:
Mihemed Seîd Husên

Ji riyên bexteweriya hevjînê:

1- Evînî: Têgeheştin daxwaziya destpêkê ye bo zilamî û di riyên wê, ew digehin jiyanek bextewer û evînî tiştê herî biha ye di jiyanê de, mirov bextewer dibe bi têgehiştina wê û mirov mandî dibe ji nedîtin û nezaniyê wê, û evîn veşartinek e ji veşartinên herî mezin di jiyanê de, evîn delîvek e giring e ji bo pêkînana jiyanek baş, ger hate berzekirin jiyan jî berz dibe, ger te xweş kir, jiyan jî pê xweş dibe. Û dibêjin: Ger av nihêne bo peydabûna giyanan, lê evînî nihêne bo peydabûna canan. Evînî gelek tiştekî baş e bo peywendiyên di navbera mirovan de, lê gelek ji xelkê me bi çavên nazdariyê li hevjînê xwe nanêrin.

2- Destpêka Bexteweriyê ji nav xweye:

Gelek rê hene bo bi destveînana jiyanek bextewer û ji hebûn, xweşbûn, cih, pere… raste lê gelek ji van alîkarin bo peydabûna bexteweriyê. Kesê ne bextewer bi xwe re, tu carî nabe bextewer bi kesên dî re û mirovên ne bextewer gelek arîşe bi hevjîna xwe û derdorê

xwe re peyda dike.

Bila destpêka bexteweriyê bi xwe re be, û fêrî bexteweriyê bibe, heta mirov bi teniya xwe be, û bibe berpirs ger tu nikaribê bextewer bê. Ger tu bextewer bê tê karibê jiyanek xeweş bi hevjîna xwe re û zarokên xwe re û derdora xwe re pêk bînê.

3- Têgeheştin û guhdarî:

Her mirovek li ser rûyê jiyanê, pêdivî ye ku hinek kes guhadariya wî bête kirin, wek çawa giyan pêdivî bi oksîcênê heye, mirov jî pêdivî bi guhdariyê heye, ger em mêze bikin li van mirovên serkevtî û serokên xemxwer, em têdigehin ku rengdêreka hevpişk heye ew jî, guhdariyeka baş heye, û em karin bibêjin xweş guhdar be û bipirse, gengeşe bike û nirînên xwe bêje.

4- Pesn û piştgirî:

Pesn û piştgirî ew jî du rengdêrin yên mirovên serkevtî û bextewer in, pêdiviye serokê xêzanê pesna hevjîna xwe bike û piştivaniya hizrên wê bête kirin, ji bo avakirina jiyanek xweş û bextewer.

5- Dilovanî bi jinê:

Jin jî mirov e mîna zilamî ye, gerek zilam bi çavê nazdariyê li jinê binêre û rêzê lê bigire, bila çiqas jin xurt be, lê di dilê wê de bangek veşartî û nazdar bo zilamî xwe heye.

6- Guhadriya hizrên hev bête kirin:

Di destpêkê de pirîsipên diyalogî di navbera jin û mêrî de, ew e bi guhdariyek baş li hizrên hev bête kirin, û axavtinên xweş, rast û bi dilekî vekirî, dûrî ji derew û ne rastiyê, û bi van pirînsipan mirov dighê ser riya rast û bextewriya jiyanê.

Bila jin biaxive û guhdariya wê bike, ger arîşyek hebe bi hev re bête gengeşekirin û bi hev re bighên çareka baş.

Li dawiyê em dikarin bibêjin, em her tiştekî dibêjin û em her tiştî dikin girêdaye bi xibreta me ya berê di jiyanê de.

Werger ji Erebî: Omer Mûsilî